# PERWERDEYA ÊZDAYETIYÊ

## SERETAYÎ

## 4

2022 / 2023

**Amadekar:**
Komîteya Ola Êzdayetiyê
Saziya Minhacan

**Lêveger:**
Komîteya Şopandinê
Komîteya Redekteyê
Komîteya Dîzaynê

**Mafên amadekirin û weşanê ji Saziya Minhacan û Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re parastî ne.**

**Çapa yekem**
**2022 / 2023**

# PÊŞGOTIN

Ji bo bipêşxistina asta perwerdeyê bi awayekî ku xwendekar bikaribe ol û çanda civaka xwe nas bike û kar û sincê herî baş di civaka xwe de pêk bîne, li gorî armanc û plana Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û bi serperiştiya Saziya Minhacan, em pirtûka “Perwerdeya Êzdayetiyê” ya refa çaran a qonaxa seretayî, dixin nava destên we.

Ev pirtûk ji pênc beşan pêk tê û her beşek ji pênc waneyan pêk tê; tenê beşa pêncem, ji çar waneyan pêk tê.

Di van waneyan de, pênaseyên hin têgeh û rewiştên girîng ên ku di civaka me de hene, hatine bicihkirin û diyarkirin. Mînak: Êzî, Lalişa Nûranî, xêr, destepakî, rastî, hevkarî ...

Her weha di vê pirtûkê de, me girîngiyeke taybet daye rêzgirtina mirov û çanda civakan û me pîroziyên ola êzdayetiyê dane diyarkirin. Di her waneyekê de, li gorî mijara wê, qewilên êzîdiyan ên pîroz hatine diyarkirin.

Piştî her waneyekê, bi mebesta ezmûnkirina xwendekar û tekezkirin li ser bikaranîna wan agahiyan di jiyana wî ya rojane de, hin pirs û çalakî hatine duristkirin. Bi armanca avakirina xwendekarekî bawermend, xwedî sinc û reftarên baş û erênî ku bikaribe di avakirina jiyaneke hevbeş di nav hemû pêkhate û olan de, destpêşxêr be, ev yek bi rengekî nû û li gorî pîvanên cîhanî û bi hizir û armancên neteweya demokratîk, pêk hatiye.

Ji bo ku ev armanc pêk bên û xwendekar naveroka pirtûkê baş nas bike û tê bigihêje, em hêvîdar in ku mamoste bi rengê herî nimûneyî agahiyên vê pirtûkê pêşkêş bike û pabendiyê bi plana belavkirina waneyan li ser sala xwendinê, bike.

## NAVEROK Û BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ


| Qonaxa | Babet | Rûpel | Hejmara parên xwendinê | meh |
|---|---|---|---|---|
| QONAXA YEKEM | Beşa yekem | 7 | | |
| | Xweda | 9 | 1 | Rezber |
| | Rêzgirtina ji dê û bav re | 11 | 1 | |
| | Rastî | 14 | 1 | Cotmeh |
| | Rewiştên axaftinê | 17 | 1 | |
| | Paqijiya dil | 19 | 1 | |
| | Hindek bîr û bawerî | 21 | ..... | |
| | Beşa Duyem: | 23 | 1 | |
| | Pîroziya Rojê | 25 | 1 | Mijdar |
| | Paqijiya laş û cilan | 27 | 1 | |
| | Rêzgirtina ji xwişk û bira re | 29 | 1 | |
| | Xêr | 31 | 1 | |
| | Rewiştên du`ayê | 33 | .... | Berfanbar + Rêbendan |
| | Beşa Sêyem | 37 | 1 | |
| | Lalişa Nûranî | 39 | 2 | |
| | Paqijiya mal û dibistanê | 42 | 2 | |
| Nirxandin û Navber | | | | |
| QONAXA DUYEM | Rêzgirtina ji derdorê re | 44 | 1 | Reşemeh |
| | Destepakî | 46 | 1 | |
| | Rewiştên nanxwarinê | 48 | .... | |
| | Hindek bîr û bawerî | 50 | 2 | |
| | Beşa Çarem | 51 | 1 | |
| | Tok û berat | 53 | 1 | |
| | Paqijiya xwezayê | 56 | 1 | Adar |
| | Rêzgirtina ji jinê re | 59 | 1 | |
| | Hevkarî û harîkarî | 62 | .... | |
| | Rewiştên rûniştinê | 64 | 1 | |
| | Du`aya piştgirêdanê | 66 | 1 | Cotan |
| | Beşa pêncem | 67 | 1 | |
| | Qewil û du`a | 69 | 1 | |
| | Rêzgirtina ji çanda civakê re | 71 | 1 | |
| | Lihevbûrîn | 73 | 1 | |
| | Hevaltî | 75 | 1 | Gulan |
| Nirxandin û Navber | | | | |



# BEŞAYEKEM

## WANEYÊN BEŞÊ

1. XWEDA
2. RÊZGIRTINA JI DÊ Û BAV RE
3. RASTÎ
4. REWIŞTÊN AXAFTINÊ
5. PAQIJIYA DIL
6. HINDEK BÎR Û BAWERÎ

# ARMANCÊN BEŞÊ

Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:

1. Nas bike ku Xweda yek e, bêşirîk û bêheval e û afrînerê erd û ezman e.
2. Nirxê dê û bav nas bike, ji wan hez bike û mafên wan biparêze.
3. Wateya rastiyê, nas bike.
4. Bizanibe di civatan de, çawa û kengî biaxive.
5. Wate û girîngiya paqijiya dil, nas bike.

# 1 XWEDA

Di baweriya êzîdiyan de, Xweda yek e, bêşirîk û bêheval e û afirînerê erd û ezman e.

**Êzî:** Navek ji navên Xweda ye.

**Di baweriya êzîdiyan de, Xweda:**

1. Yek e, bêşirîk û bêheval e.
2. Xweda her ew e her ew e û dê her hebe.
3. Bêyî wî, her tişt vala ye.
4. Xwedanê şev û rojê ye.
5. Dizane li behra çend keşkûl av e û li besta çend kevir di nav e (Ew dizane di deryayan de, çend çelapek av hene û li deştan çend kevir hene).

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| Bêşirîk | bitenê - bêhevpar |
| Afirîner | çêker - xaliq |
| Best | deşt - cihê ku kevir lê pir in. |

## Pirs

1. **Êzî kî ye?**
2. **Kê kinyat afirandiye?**
3. **Baweriya êzîdiyan bi çi tê?**

## Hîndarî

Em bersiva rast hilbijêrin:

**1-** Xweda, xwedanê:

**a-** Rojê ye
**b-** Şevê ye
**c-** Şev û rojê ye

**2-** Xweda:

**a-** Biheval e
**b-** Bêşirîk e
**c-** Bişirîk e

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Baweriya êzîdiyan bi Xwedayekî tenê tê.
2. Xweda yek e.
3. ........................................................

# 2 RÊZGIRTINA JI DÊ Û BAV RE

Rêzgirtina ji dê û bav re, li ser her mirovî ferz e. Dayîk û bav, zaroka xwe ji biçûkanî ve û heta ku mezin dibe jî xwedî dikin û lê baldar in; kar, xebat û hezkirina dê û bav, ji bo zarokên wan in.

Divê mirov ji dayîk û bavê xwe hez bike, wan biparêze, nirx û qîmetê bide wan, şîretên wan bi cih bîne û can û dilê wan neêşîne.

## Bixwînim û fêr bibim

1. Ê ku qedrê dayîk û bavê xwe digire, qedrê Xweda digire.
2. Ji dayîk û bavê xwe, hez bikin.
3. Harîkariya dayîk û bavê xwe bikin û rêzgirtina wan bigrin.

**Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne**

**Bi destûra Xweda**

**Heq li wan bikin silava**
**Ziyartî bin li destan û çava**
**Hero siba û hemû gava**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
| --- | --- |
| Harîkarî | alîkarî - piştevanî |
| Gav | çax - dem |
| Divê | pêwîst - gerek |

## Çalakî

Valahiyên li jêr dagirin:

**a-** Pêwîst e mirov ji dayîk û bavê xwe ....................

**b-** Qedrê dê û bav ji qedrê .................

## Hîndarî

**Em bersiva rast hilbijêrin:**

**1-** Rêzgirtina dê û bav:

**a-** Ferz e

**b-** Ne ferz e

**c-** Ne baş e

**2-** Divê ziyarta dest û çavên dê û bav:

**a-** Her sal bê kirin.

**b-** Her dem û gav bê kirin

**c-** Her êvar bê kirin

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Rêzgirtina dê û bav ferz e.
2. Divê mirov qedrê dê û bavê xwe bigre.
3. ..................................................

# 3 RASTÎ

Rastî: Mirov tiştên ku bûye bînerê wan, bê kêmkirin an zêdekirin, raber bike.

Ji ber ku rastî rêya Xweda ye û ji sincên herî baş e, nabe em gotinên nerast bibêjin û ji rêya rastiyê derkevin.

Pêwîst e, mirov rast biaxive, baş kar bike û bi xwe, malbat, heval û derdora xwe re, rast be.

## Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne

**Bi destûra Xweda**

**Rastî riya Xwedê ye**
**Derewîn dijminê Xwedê ye**
**Mirovê rastgo yê xweştivî ye**
*** 
**Ne bi zor e ne bi zar e**
**Tu ji bilindiya were xware**
**Rêya rastiyê diyar e**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| Xweştivî | delalî, `ezîz |
| Zor | Xurtî |
| Zar | Ziman |

## Pirs

**1.** Rastî çi ye?
**2.** Di civakê de, kîjan mirov xweştivî ye?
**3.** Rê bi çi diyar e?
**4.** Hin awayên rastiyê diyar bike.

## Hîndarî

1. Valahiyên li jêr dagirin:

**a-** Rastî rêya ............... ye, derewîn ................ Xwedê ye.
**b-** Mirovê .................. yê xweştivî ye.

2. Em bersiva rast hilbijêrin:

- Rastî sincekî:

**a-** Baş e
**b-** Xerab e
**c-** Ne baş e

- Civak ji mirovê rastgo:

**a-** Hez dike
**b-** Hez nake
**c-** Dûr dikeve

- Mirovê ku rast biaxive û kar bike:

**a-** Rast e
**b-** Şaş e
**c-** Xerab e

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Rastî sincekî herî baş e.
2. Rastî qedir û qîmetê ji mirov re çêdike.
3. ..................................................

# 4 REWIŞTÊN AXAFTINÊ

Dema ku mirov di civatekê de biaxive, pêwîst e hin rewiştên diyar, pêk bîne û ji van rewiştan:

1. Mirov rast biaxive û xwe ji derewan dûr bixe.
2. Mirov baş guhdarî bike û gotinên kesî nebire.
3. Mirov nas bike kengî û çawa biaxive.
4. Gotinên mirov nerm bin û kesî neêşînin.
5. Gotinên mirov ne dûrî mijara civatê bin.
6. Gotinên mirov xweş bin û her dem xêrxwaz be.



**Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne**

**Bi destûra Xweda**

**Hey zimano yê sotinê**
**Xeberek wa heye ne ya gotinê**
**Dê bo çi dahir keye rûyê dinê?**

## Pirs

**1.** Sê rewiştên axaftinê, bihejmêre.
**2.** Di civatan de, pêwîst e mirov çawa biaxive?
**3.** Divê gotinên mirov di civatê de, çawa bin?
**4.** Divê xwendekar çawa bi mamosteyê xwe re biaxive?

## Hîndarî

1. Valahiyên li jêr dagirin:
   **a-** Hey zimano yê .................
   **b-** ...................wa heye ne ya ...............
   **c-** Mirov bi dengê .................. neaxive.

2. Hevokên li jêr, ên rast bi (√) û yên şaş bi (×) nîşan bikin:
   **a-** Pêwîst e mirov rast biaxive. ( )
   **b-** Pêwîst e mirov li tu kesî guhdarî neke. ( )
   **c-** Pêwîst e gotinên me xweş û yên xêrê bin. ( )

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Axaftinên me rast bin.
2. Gotinên me nerm û xweş bin.
3. ..................................................

# 5 PAQIJIYA DIL

Ji bo ku mirovahî bi aştî bijî, divê mirov dilê xwe ji rik û kînê paqij bike û xwedî dilekî pak be. Ji bo vê yekê jî divê em xêr, xweşî û aştiyê ji mirovahiyê re bi giştî, bixwazin.

Mînak:

1. Em bi dilekî paqij nêzî Xweda bibin.
2. Em tiştên xerab û biziyan ji tu kesî re nexwazin.
3. Em bi niyazeke baş û bi dil û zimanekî pak, xêrê bixwazin.
4. Beriya ku em du`ayan bikin, em dilê xwe ji rik û kînê paqij bikin.
5. Em bi dilpakî tev bigerin, ji ber ku Xweda ji mirovê dilpak hez dike.

## Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne

### Bi destûra Xweda

**Gelî bira êk megirin bi kerb û kîna**
**Ev fêniya fêniyeka derewîn e**
* * *
**Sera wî mirarî ji êk megirin sarî**
**Ev dinya xweş e bi yarî**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| Fîne | Dem û hêwan |
| Wî mirarî | Malê din |

## Pirs

**1.** Mirov çawa dilê xwe paqij dike?
**2.** Divê mirov xêr û xweşiyê ji kê re bixwaze?
**3.** Em ji mirovên xwedî çi taybetiyan hez dikin?
**4.** Valahiyên li jêr dagirin:
**a-** Gelî bira êk megirin bi .............. û ................
**b-** Dinya xweş e bi .............

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Dilê pak ji baweriyê tê.
2. Xweda ji mirovê dilpak hez dike.
3. ..........................................................

# HINDEK BÎR Û BAWERÎ

» Baweriya êzîdiyan, bi yektabûna Xweda tê.

» Baweriya êzîdiyan bi Tawisî Melek tê ji ber ku yekem nûr e ku ji nûra Xweda hatiye afirandin û jê heft milyaket hatine afirandin û ew navek ji navên Xweda ye.

» Baweriya me bi rêûresm, qewil, beyt, qesîde û du`ayên me, tê.

» Baweriya me, bi ol û erkanên me tê.

» Baweriya me, bi xas û çakên me tê.

» Baweriya me, bi nedir û xêran tê.

» Baweriya me, bi pîroziya Tawis û Xirqe tê.

» Baweriya me, bi pîroziya agir û Rojê tê.

» Baweriya me, bi pîroziya roja çarşemê tê.

» Baweriya me, bi Roja Axretê, Buhişt û Dojê tê.

» Baweriya me, bi mirin û kirasguherînê tê.

# BEŞADUYEM

## WANEYÊN BEŞÊ

1. PÎROZIYA ROJÊ
2. PAQIJIYA LAŞ Û CILAN
3. RÊZGIRTINA JI XWIŞK Û BIRA RE
4. XÊR
5. REWIŞTÊN DU`AYÊ

# ARMANCÊN BEŞÊ

Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:

1. Girîngî û pîroziya Rojê li cem êzîdiyan, nas bike.
2. Girîngiya paqijiya laş û cilan, nas bike.
3. Nirxê rêzgirtina biratiyê, nas bike û pêk bîne.
4. Wateya xêrê nas bike û xêrê ji mirovahiyê re bi giştî, bixwaze.
5. Pênase û awayê du`akirinê, nas bike.

# 1 PÎROZIYA ROJÊ

Roj, hêmanekî  xwezayê ye û pêwîstiya mirov, lawir, şînatî û her tiştên ku di cîhanê de hene, bi wê heye. Em sûdên baş jê digirin; roj cîhanê ronî dike û rola wê di paqijiyê de jî heye.

Di baweriya êzîdiyan de, Roj cihekî pîroz digire; ew roniya Xweda ye, xêr,  bereket û qubleya êzîdiyan e.

Dema êzîdî du`ayên xwe dikin, ew berên xwe didin Rojê. Bi rojhilatê re, êzîdî peristinê ji Xweda re dikin û du`aya sibehê dikin. Bi rojavayê re “dema Roj diçe ava” jî êzîdî peristinê ji Xweda re dikin û du`aya êvarê dikin.



## Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne

### Bi destûra Xweda

**Roj qubleta `îbadetê**
**Rabe li ber xilmetê**
**Ji Xwedê bixwaza tifaq û rehmetê**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| Nûr | Ronahî |
| Du`a | lava, diroz, daxwaz |

## Çalakî

Valahiyên li jêr dagirin:

**a-** Roj .............. Xweda ye.
**b-** Roj .............. û bereket e.
**c-** Roj ............ me ye.

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Roj li cem êzîdiyan pîroz e.
2. Roj qubleya êzîdiyan e.
3. ......................................................

## 2 PAQIJIYA LAŞ Û CILAN

Ji bo ku em laşê xwe ji nexweşiyan biparêzin, pêwîst e mirov li paqijiya xwe baldar bin. Ji bo paqijiya laş û cilûbergan divê mirov:

1. Her sibeh dest, çav û devê xwe bişo.
2. Beriya xwarinê û piştî wê, destên xwe baş bişo.
3. Neynûkên xwe jê bike, da ku gemar nekeve ber wan.
4. Her dem cilûbergên qirêj, biguherîne û wan baş bişo.
5. Beriya razanê, gore û lingên xwe bişo.

Paqijî ji baweriyê ye û Xweda ji mirovê paqij hez dike.



**Êzîdî pir li paqijiya laş û cilên xwe baldar in û ji ber vê yekê, cilên spî li xwe dikin; ji bo ku dema gemar xwe li wan bigire, zû bibînin.**

## Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne

### Bi destûra Xweda

**Şûştin fer e û xweş tişt e**
**Paqijî jê tê bêhna behişt e**
**Bişo serî û dest û çava û laşî û cila gişte**

## Pirs

1. Çawa mirov dikare li paqijiya laş û cilên xwe, baldar be?
2. Çima em neynûkên xwe jê dikin?
3. Çima êzîdî cilên spî li xwe dikin?
4. Hevokên li jêr, ên rast bi (√) û yên şaş bi (×) nîşan bike:
   - a- Paqijî, ji baweriyê ye. ( )
   - b- Paqijî, tendirustiya me diparêze. ( )
   - c- Cilûbergên qirêj, tên şewitandin. ( )
   - d- Bêhna buhiştê, ji mirovê paqij tê. ( )

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Paqijî ferz e.
2. Paqijî saxlemî ye.
3. ...................................................

# 3 RÊZGIRTINA JI XWIŞK Û BIRA RE

Ji bo jiyana malbatê bi kêf û xweşî derbas bibe, pêwîst e zarok rêzê ji dayîk û bavê xwe re bigirin û xwişk û bira jî rêzê ji hev û du re bigirin û ji hev hez bikin.

Mînak:

1. Gotinên mirov bi xwişk û birayê wî re, nerm û xweş bin.
2. Xwişk û bira bi hev re rast bin; mafên hev biparêzin û mil bi mil, bi hev re bin.
3. Xêr û xweşiyê, ji hev re bixwazin.
4. Dema yek ji xwişk û birayan bikeve şaştiyan, divê dê û bav, xwişk û bira wî/ê şîret bikin.
5. Em mafên hev biparêzin.



## Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne

### Bi destûra Xweda

**Heke birayekî te ji meqbûl e**
**Bi te re yê sotî dil e**
**Û li ser cewaba  xwe ya ewil e**
**Heke ew desta ji te bihêle**
**Tu desta jê mehêle**

## Pirs

**1.** Divê xwişk û bira ji hev re çawa bin?
**2.** Endamên malbatê çawa alîkariya hev dikin?
**3.** Di malbatê de, çi hêman dibe sedema jiyana xweş?
**4.** Girîngiya rêzgirtinê di navbera xwişk û bira de, diyar bike.
**5.** Valahiyên li jêr dagire:
  **a-** Heke birayekî te ji ..................
  **b-** Bi te re yê .............. dil e.
  **c-** Li ser .............. xwe ........ ewil e.

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Rêz û hezkirina xwişk û bira ferz e.
2. Pêwîst e xwişk û bira hev biparêzin.
3. ..........................................................

# 4 XÊR

Xêr: Ew tiştê baş ê ku mirov ji bo kesekî dike yan dide kesekî, bêyî ku berdêlekî jê bixwaze, yan jî berjewendiyên wî li pê hebin.

Xêr, bi kiryar û gotinan tê kirin.

Mînak: Dema mirovekî xizan hebe, em dikarin alîkariya heyberî pêşkêşî wî bikin û bêyî ku em cudahiyê bixin navbera ol, reng û neteweyan, xêrê bi mirovahiyê re bi giştî bikin.

## Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne

**Bi destûra Xweda**

**Heke tu êkî dibînî**
**Xêrekê vêra bigehînî**
**Nebêjê tu ji kî dînî**
*******
**Heke te xêrek di riya Xwedê da dabî**
**Te di avê da berdabî**
**Li ba Xwedê qet hinda nabî**

## Pirs

**1.** Xêr çi ye?
**2.** Xêr bi çi awayî tê kirin?
**3.** Sûdên xêrê diyar bike.
**4.** Valahiyên li jêr dagirin:

**a-** Heke tu ................. dibînî.
**b-** ............. vêra ................
**c-** Nebêje tu ji kî .............
**d-** Divê em xêrê ji ................................. giştî bixwazin.

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Xêr, tiştekî baş e.
2. Xêr, mirovahiyê bi hev ve girê dide.
3. ..........................................................

# 5 REWIŞTÊN DU`AYÊ

**Dema ku mirovê êzîdî du`a bike, pêwîst e beriya du`ayê, van mercan pêk bîne:**

1. Dest û çavên xwe bişo û xwe pak bike.
2. Pişta xwe girê bide û destê rastê deyne ser destê çepê.
3. Pêxwas berê xwe bide Rojê.
4. Peristinê ji Xweda re bike û xwe ji Xweda re biçimîne.
5. Li cihekî paqij du`aya xwe bike.
6. Bi tena serê xwe du`a bike (du`a; têkiliya di navbera mirov û Xweda de ye).

**Di baweriya ola êzdayetiyê de, gelek cureyên du`ayan hene:**

1. **Du`ayên xêrê:** Du`aya heyvê, du`aya sifrê, du`aya li ser giyanê mirî û hwd.
2. **Du`ayên çareseriyê:** Du`aya zerikê, du`aya nezerê û hwd.
3. **Du`ayên ferz:** Du`ayên sibeh û êvarê.

## Vê sebeqeya ji du`aya êvarê bi dengê bilind bixwîne

### Bi destûra Xweda

**Ya siwarê rojhelatê û rojavayê**
**Tu bidê xatira dotê û dayê**
**Tu me xilas kê ji qedayê ji belayê**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| Dot | Heyv |
| Day | Roj |



## Pirs

**1.** Du`a çi ye?
**2.** Hin cureyên du`ayan li cem êzîdiyan, diyar bike.
**3.** Mirov hêvî û du`ayên xwe, ji kê dike?
**4.** Beriya ku em du`ayê bikin, divê em çi amadekariyan bikin?
**5.** Hevokên li jêr, ên rast bi (√) û yên şaş bi (×) nîşan bike:

- **a-** Du`a li cihekî paqij tên kirin. ( )
- **b-** Du`aya zerikê, ji du`ayên xêrê ye. ( )
- **c-** Em du`ayên xwe ji Xweda dikin. ( )
- **d-** Di du`akirinê de, em berên xwe didin Heyvê. ( )

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Du`a ferz e.
2. Du`a tenê ji Xweda re ye.
3. ........................................................

# BEŞA SÊYEM

## WANEYÊN BEŞÊ

1. LALIŞA NÛRANÎ
2. PAQIJIYA MAL Û DIBISTANÊ
3. RÊZGIRTINA JI DERDORÊ RE
4. DESTEPAKÎ
5. REWIŞTÊN NANXAWARINÊ
6. HINDEK BÎR Û BAWERÎ

## ARMANCÊN BEŞÊ

Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:

1. Pîroziya Lalişê li cem êzîdiyan, nas bike.
2. Çawaniya gera li Lalişê, nas bike.
3. Girîngiya paqijiya mal û dibistanê, nas bike.
4. Mafên tiştên derdora xwe, nas bike û biparêze.
5. Wateya destepakiyê, nas bike û di jiyana xwe de pêk bîne.
6. Rewiştên nanxwarinê, nas bike û pêk bîne.

# 1 LALIŞA NÛRANÎ

Laliş, peristgeha pîroz a êzîdiyan e û cihê nîşangehên hemû xas û çakên wan e. Di bîr û baweriya êzîdiyan de, Laliş hêvênê (heyvanê) erdê ye. Lalişa pîroz li başûrê Kurdistanê ye; dûrahiya wê ji bajarê Şêxanê yê girêdayî Dihukê nêzî 15 km ye.

Laliş di hundirê geliyekî de ye û dikeve navbera sê çiyayan:

1- Çiyayê Mişetê
2- Çiyayê Erefatê
3- Çiyayê Hizretê



## Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne

### Bi destûra Xweda

**Laliş ku dihate**
**Li erdê şîn dibû nebat e**
**Pê zeyinîn çiqas kinyat e**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| Peristgeh | Cihê peristinê |
| Zeyinîn | Xemilîn |
| Nebat | keskahî, şînatî |
| Kinyat | Dunya |
| Xas û çak | Xwedanas |

## Dema ku êzîdî diçin Lalişê, van erkan pêk tînin:

1. Bi paktî û paqijî serdana Lalişê dikin.
2. Pêxwas li Lalişê digerin.
3. Serdana gorên xas û çakan dikin.
4. Xwe ji kar û axaftinên xerab, dûr dixin.
5. Li def, şibab û qewlan guhdarî dikin.
6. Hêvî û du`ayên xwe dikin.
7. Tevlî rêûresmên ku li Lalişe tên kirin, dibin.
8. Li cihên pîroz baldar in.

## Pirs

**1.** Laliş çi ye?
**2.** Her sê çiyayên ku Laliş dikeve navbera wan, bi nav bike.
**3.** Dema êzîdî diçin Lalişê, pêwîst e çi bikin?
**4.** Girîngiya Lalişê li cem êzîdiyan diyar bike.
**5.** Valahiyên li jêr dagirin:

**a-** Laliş li ................ ye, nêzîkî bajarê ................ yê girêdayî ............. ye.

**b-** Dema ku em biçin Lalişê, divê em .............. mezargehên .................. û ................ bikin.

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Laliş li cem êzîdiyan, cihê herî pîroz e.
2. Mezargehên xas û çakên êzîdiyan, li Lalişê ne.
3. ........................................................

# 2 PAQIJIYA MAL Û DIBISTANÊ



Li rex paqijiya dil û laş, divê mirov li paqijiya derdora xwe jî baldar be. Mînak: mal, dibistan û xweza.

Mal, cihê ku em lê dijîn û dibistan jî cihê ku em lê perwerde dibin, pêwîst e ku em li paqijiya wan, pir baldar bin.

Ji bo vê yekê jî divê em:

1. Bi lîstikên ku toz û ziyanê çêdikin, nelîzin.
2. Em gemarê neavêjin erdê û heke gemara li erdê hebe, em wê bixin gelaşdankê.
3. Da ku hewaya paqij derbasî hundir bibe, pêwîst e em her sibeh derî û pencereyan vekin.
4. Li malê, em bi dayîk û bavê xwe re û li dibistanê jî bi mamoste û hevalên xwe re, alîkar bin.

5. Li ser derî û dîwaran, nivîsan nenivisînin.
6. Dema ku em bibînin mirovek gemarê diavêje erdê, divê em wê gemarê rakin û hev û du hişyar bikin û di derbarê paqijiyê de, şîretan li hev bikin.

## Pirs

1. Ji bo ku mal û dibistana me her dem paqij be, pêwîst e em çawa tev bigerin?
2. Divê mirov çawa li paqijiya mal û dibistanê baldar be?
3. Girîngiya paqijiya mal û dibistanê, diyar bike.
4. Hevokên li jêr, ên rast bi (√) û yên şaş bi (×) nîşan bike:
   - a- Divê em li ser dîwaran nivîsan nenivîsînin. (   )
   - b- Em kaxez û gemarê biavêjin erdê. (   )
   - c- Beriya ku em derbasî cihekî bibin, divê em pêlavên xwe paqij bikin. (   )
   - d- Dibistana ku paqij be, xwendekarê wê serkeftî ne. (   )

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Paqijiya mal û dibistanê, nîşana hezkirinê ye.
2. Paqijiya mal û dibistanê, tiştekî girîng e.
3. .....................................................

# 3 RÊZGIRTINA JI DERDORÊ RE

Mirov rêzê ne tenê ji malbata xwe re digire; ferz e ku mirov rêzê ji cîran û derdora xwe re jî bigire. Her weha divê mirov ji mirovên temenmezin re rêzeke taybet, bigire. Jixwe li dibistanê jî rêzgirtina ji mamoste re, mîna rêzgirtina ji dê û bav re ye.

Mafên cîran û civakê li ser me hene û di aliyê rêzgirtina wan de, hin erk dikevin ser milên me, ew jî ev in:

1. Bi dengê pir bilind neaxivin û cîranan tengezar nekin.
2. Gotinên me xweş bin û danûstandina me nerm be.
3. Weke ku em mala xwe diparêzin, em malên cîranên xwe jî biparêzin.
4. Di şîn û şahiyan de, bi wan re alîkar bin.
5. Êş û ziyanan negihînin wan.

Baweriya êzdayetiyê, hezkirin û rêzgirtin li ser me sepandî ye, ji ber ku di baweriya êzîdiyan de, pêwîst e mirov bi xweza, civak û hemû afrîdeyan re bi aştî û azadî bijîn. Her weha, divê mirov bê ku cudahiyê bixe navbera ola êzdayetiyê û hemû olên din, rêzgirtin û hezkirinê nîşan bide.

**Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne**

**Bi destûra Xweda**

**Borê hur siwar bin**
**Bi nefsa ra guhdar bin**
**Bi hemû mexlûqa ra yar bin**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| Bor | Hesp |

## Pirs

1. Di civakê de, divê em rêzê ji kê re bigirin?
2. Mafên cîranan diyar bike.
3. Li gorî baweriya êzîdiyan, divê mirov çawa be û bi çi rengî nêzî derdora xwe bibe?
4. Hevokên li jêr, ên rast bi (√) û yên şaş bi (×) nîşan bike:
   - a- Em cîranan tengav nekin. ( )
   - b- Em neçin gel cîranan. ( )
   - c- Mirov bi hev re alîkar bin. ( )

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Rêzgirtina derdorê ferz e.
2. Di civakê de, divê di navbera ol, netewe ... de, rêzgirtin û hezkirin hebe.
3. ........................................................

# 4 DESTEPAKÎ

Destepakî sincekî mezin e, ew tê wateya rastpêkanîna kar, pêkanîna sozê û li ser vê yekê, berdewamkirin e.

Destepakî, nîşaneke li ser temambûn û xurtbûna baweriyê ye. Divê her kes vê taybetiyê di giyanê xwe de biçîne û di jiyana xwe ya rojane de, pêk bîne.

Mirovên destepak bi hin taybetiyan tên naskirin, ji wan jî ev in:

1. Her dem rastgo ye û ji derewan dûr e.
2. Xwedanas e.
3. Xwedî sincên baş e.
4. Diziyê nake û bê destûr amûrên tu kesî nabe.

Li gorî taybetiyên mirovê destepak, em dibînin ku destepakî bi rastî û sincên baş ve, hatiya girêdan. Her weha kesên ku li ser soza xwe bin û gotin û malên mirovan biparêzin, di civakê de cihê rêzgirtinê ne.

## Pirs

**1.** Destepakî çi ye?
**2.** Em çawa mirovên destepak nas dikin?
**3.** Destepakî bi çi ve hatiye girêdan?
**4.** Di civakê de, girîngiya mirovên destepak çi ye?
**5.** Hevokên li jêr, ên rast bi (√) û yên şaş bi (×) nîşan bike:

**a-** Mirovê destepak xwedanas e. ( )
**b-** Civak, mirovê destepak naxwaze. ( )
**c-** Mirovê destepak ji rastiyê hez dike. ( )
**d-** Mirovê destepak xwedî sincekî baş e. ( )

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Mirovê destepak xweştivî ye.
2. Destepakî ji sincên baş e.
3. .................................................

# 5 REWIŞTÊN NANXWARINÊ

Di ola êzdayetiyê de, dema mirov dest bi xwarinê dike, hin rewiştên taybet hene mirov wan pêk tîne, ji wan jî:

1. Beriya xwarinê û piştî wê, destên xwe dişo.
2. Beriya ku dest bi xwarinê bike dibêje: “**Bi destûra Xweda**.”
3. Ji ber ku xwarin pîroz e, nabe mirov di dema xwarinê de, biaxive.
4. Nabe mirov beriya dê û bav xwe yan beriya kesên jê mezintir, dest bi xwarinê bike.
5. Xwarina li ber xwe bixwe; nabe mirov destê xwe dirêjî xwarina ber hevalê xwe bike.
6. Dema ku bikuxe berê xwe nede xwarinê.
7. Dema xwarinê bi dawî dike, dibêje: “**Ya Xweda me kêm kir tu zêde bikî**.”

## Pirs

1. Dema mirovê êzîdî dest bi xwarinê bike, pêwîst e çi bibêje?
2. Du rewiştên nanxwarinê diyar bike.
3. Dema em xwarinê bi dawî dikin, em çi dibêjin?
4. Girîngiya rewiştên nanxwarinê çi ye?
5. Hevokên li jêr, ên rast bi (√) û yên şaş bi (×) nîşan bike:

   a- Divê mirov di dema xwarinê de, biaxive. ( )

   b- Nabe em beriya dê û bavê xwe, dest bi xwarinê bikin. ( )

   c- Divê mirov xwarina ber xwe bixwe. ( )

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Zad pîroz e.
2. Rewiştên nanxwarinê ferz in.
3. ..........................................................

# HINDEK BÎR Û BAWERÎ

Êzî padşê me ye

Tawisî Melek şehda û îmana me ye

Laliş peristgeha me ye

Kaniya Sipî mora me ye

Şêx Adî serwerê me ye

Şêşemis meferê me ye

# BEŞA ÇAREM

## WANEYÊN BEŞÊ


1. TOK Û BERAT
2. PAQIJIYA XWEZAYÊ
3. RÊZGIRTINA JI JINÊ RE
4. HEVKARÎ Û HARÎKARÎ
5. REWIŞTÊN RÛNIŞTINÊ
6. DU`AYA PIŞTGIRÊDANÊ

## ARMANCÊN BEŞÊ

Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:

1. Tok û beratê, nas bike.
2. Girîngiya paqijiya xwezayê û çawaniya baldarbûna li wê, nas bike û pêk bîne.
3. Rola jinê di civakê de û awayê rêzgirtina ji wê re, nas bike.
4. Wateya hevkariyê, nas bike.
5. Awayê rûniştina rast a di civatan de, nas bike.

# 1 TOK Û BERAT

Tok: Yek ji nîşaneyên êzîdiyan e. Tok toka Êzî ye, divê her êzîdiyek tokê li xwe bike. Rengê tokê spî ye û teşeyê wê girover e û ew  di bin cilan de, tê lixwekirin.

## Ji du`aya tokê

**Bi destûra Xweda**

**Tok  ji êzîdiya ra ziyaret e**
**Riya wê bi xilmet e û `ibadet e**
**Ew jî ferzeke ji ferzên heqîqet e**



Berat: Yek ji nîşaneyên êzîdiyan e, ew ji axa Lalişê tê çêkirin. Wê axê, ji şkefteke ku di geliyê Lalişê de ye derdixin, ji wê şkeftê re dibêjin (Şkefta Beratê) û bi ava Kaniya Spî vedistirên.

Ji wê axê, giroveran çêdikin û li ber rojê hişk dikin.

Berat nasnameya mirovê êzîdî ye.

**Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne**

**Bi destûra Xweda**

**Çi sibeyek bi qîmet e**
**Padşê min nazil kiribo `ilim û berat û xet e**





## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| Vestirên | Têkel dikin |
| Nîşan | hêma - sembol |

## Pirs

1. Tok çi ye?
2. Berat ji çi çêdibe?
3. Rengê tokê çi ye?

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Tok toka Êzî ye.
2. Berat ji axa Lalişa pîroz e.
3. ........................................................

## 2 PAQIJIYA XWEZAYÊ

Ji ber ku mirov ji elementên xwezayê çêbûye û ji ber sûda xwezayê, ola êzdayetiyê xwezayê pir pîroz dibîne.

Ji bo xwezayeke paqij, hin erk dikevin ser milên me:

1. Avê qirêj nekin.
2. Daran nebirin.
3. Agir di nav zevî û daristanan de, vênexin.
4. Gemarê neavêjin erdê û cihên gemar paqij bikin.
5. Daran biçînin.
6. Weke ku hûn li paqijiya laş, mal û dibistana xwe baldar in, li paqijiya xwezaya xwe jî baldar bin.





**Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne**

**Bi destûra Xweda**

**Heke te muminek dît `îbadet ke**
**Heke te darek dît  ziyaret ke**
**Heke te erdek dît îşaret ke**



## Pirs

1. Çima xweza li cem êzîdiyan pîroz e?
2. Ji bo paqijiya xwezayê hin erkên me hene, çar erkan ji wan diyar bike.
3. Divê em çawa li paqijiya xwezayê baldar bin?
4. Hûn çawa xwezayê diparêzin?
5. Valahiyên li jêr dagire:
   a- Heke te erdek dît .............
   b- Heke te  ..................  dît îbadet  ke.
   c- Heke te darek dît ...........
   d- Divê em daran ...........

## Çalakî

Di derbarê xwezayê de, sê hevokan binivîsin:

a- ......................................................................
b- ......................................................................
c- ......................................................................

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Xweza pîroz e.
2. Li xwezayê baldar bin.
3. .....................................................

# 3 RÊZGIRTINA JI JINÊ RE

Di bîr û baweriya êzîdiyan de, jin cihekî pîroz digire û di dîrokê de, di nava civakê de rêzeke taybet ji jinê re hatiye girtin. Rola jinê di rêûresmên olî û civakî de, roleke sereke ye; jin li gel mêr rajeya Lalişa Nûranî dike û mil bi mil bi mêr re, mal avakiriye û çanda xwe parastiye. Her weha bi hezarên salan, jina êzîdî ola xwe parastiye û nehiştiye winda bibe.

**"Asta peşketina civakê, bi asta rola jinê vê girêdayî ye."**



**Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne**

**Bi destûra Xweda**

**Jin û mêr her du ji ciyekî**
**Û heqê wan her du weke yekî**
**Her du li roja axiretê bi hesabekî**



Ji bo rêzgirtina ji jinê, re pêwîst e:

1. Mafên jinê di civakê de, bên parastin.
2. Cudahî di navbera jin û mêr de, tune be.
3. Di mal û civakê de, jin xwedî biryar be.

## Pirs

**1.** Di dîrokê de, rola jinê di civakê de çi bû?
**2.** Ji bo rêzgirtina jinê, pêwîst e em çawa tev bigerin?
**3.** Civak çawa bi pêş dikeve?
**4.** Rola jinê di civaka me de, diyar bike.
**5.** Valahiyên li jêr dagire:
  **a-** Divê em cudahiyê nexin navbera .............. û ..............
  **b-** Jin û .............. her du ji ...............
  **c-** Heqên wan her du weke ................

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Jin û mêr wekhev in.
2. Parastina mafê jinê.
3. ........................................................



# 4 HEVKARÎ Û HARÎKARÎ

Hevkarî: Ew karên ku mirov bi hev re dikin (du mirov an çend mirov) û di vî karî de hevpar in.

Harîkarî: Tê wateya dana tiştekî ji kesekî re, yan kirina karekî ji bo kesekî din da ku karê wî bi ser bikeve.

1. Ji bo ku civak bi ser bikeve û mirovên wê serkeftî bin, pêwîst e ku hevkarî û harîkarî, di nava civakê de hebin; ango mirov ji nêrînên teng û bercewendiyên xwe yên kesayatî, dûr bikeve.
2. Mirov nikare bi tena serê xwe bijî û her mirov di civakê de bi rêya hevkarî û harîkariyê, mirovê din temam dike.
3. Pêwîst e, mirov di rêya xêrê de, bi hev re harîkar bin.
4. Pêwîst e, mirov bi malbat û derdora xwe re alîkar be. Her weha li dibistanê jî ji bo ku em bi hev re asta xwe bi pêş bixin û bi ser bikevin, divê em bi hevalên xwe yê xwendinê re, harîkar bin. Her weha ji bo ku wane baş bên fêmkirin, pêwîst e em bi mamosteyên xwe re, harîkar bin.
5. Di malbatê de, divê em bi dayîk, bav, xwişk û birayên xwe re, harîkar bin.
6. Harîkarî, bi rêya kar û gotinan, tê kirin.

## Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne

### Bi destûra Xweda

**Peyva xweş `îbadet e**
**Zimanê şêrîn xweşxilmet e**
**Harîkarî bixwe xîret e**
*******
**Heke du bira bi hev ra kirin tebayî**
**Wê çiyayî danana ser çiyayî**

### Pirs

**1.** Hevkarî û harîkariyê, pênase bike.
**2.** Çima pêwîstiya civakê bi harîkariyê heye?
**3.** Divê mirov çawa bi hev re harîkar bin?
**4.** Harîkarî, bi  rêya çi tê kirin?

### Çalakî

**a-** Li dibistanê, tu çawa harîkariya hevalên xwe dikî?
**b-** Li malê, tu çawa harîkariya dê û bavê xwe dikî?

### Ji waneyê fêr bibim:

1. Girîngiya harîkariyê.
2. Sedema harîkariya mirovan bi hev re.
3. ........................................................

# 5 REWIŞTÊN RÛNIŞTINÊ

Di civakê de gelek kombûn çêdibin, girîng e mirov bizanibe çawa derbasî odeya civatê bibe; çawa rûnê û çawa cihê xwe di civatê de bigire.

Ji her civatekê re, taybetiyên wê yên cuda hene. Mînak: Di civata olî de, divê em baş guhdar bin û di civata asayî de, xwedî tore bin û sûdê bidin kesên derdora xwe. Her weha di malê de jî mirov bêhtir di rûniştinê de, serbest be û xwe vehesîne.

Di civatan de hin tore hene, pêwîst e em wan pêk bînin:

1. Dema em derbasî civatê bibin, silavê bikin.
2. Bi rûyekî liken silavê bikin û pirsa rewşa mirovê amade bikin.
3. Xweşik rûnên; ango nabe mirov pal bide, lingên xwe dirêj bike yan wan deyne ser hev.
4. Nabe em beriya kesên ji xwe mezintir, an di ser wan re rûnên.
5. Em henekên destan bi hev nekin.
6. Nabe ku em bê destûr li cihê kesekî din an di navbera du kesan de, rûnên.



## Pirs

1. Dema mirov derbasî civatekê bibe, pêwîst e çawa tev bigere?
2. Di kîjan rewşan de, em dikarin di navbera du kesan de, rûnên?
3. Çar xalên sereke ên rewiştên rûniştinê, diyar bike.
4. Bersiva pirsên li jêr, bi "**erê**" yan "**na**" yê bide:
   a- Divê em beriya kesên ji xwe mezintir rûnên? ( )
   b- Divê em lingên xwe daneynin ser hev? ( )
   c- Divê em baş guhdar bin? ( )
   d- Divê em di civatan de pal bidin? ( )

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Toreya civatê.
2. Taybetiyên her civatekê.
3. ..................................................

# DU`AYA PIŞTGIRÊDANÊ

**Ji qewlê sebrê**
**Bi destûra Xweda**
**Ji qewlê Şêx Hevdê Babzer e**
**Xeberek hatiye ji asmanê ser e**
**Got: Sebir bo mêra xêr û neder e**

**Sebir bo mêra xêr û awaz e**
**Û çendî li dil heye daxwaz e**
**Bi sebrê hasil dibe ew miraz e**

**Ew miraza bi sebrê hasil bû**
**Ev dinya bi sebrê dahir bû**
**Xwedan sebir li ba Xwedê bi xatir bû**

**Li ba Xwedê bi xatir bû xwedan sebir e**
**Hincî kesê herî bi lez û bê sebir e**
**Li ber hinda bû rê û derb û xeber e**

**Em kêm in Xweda yê temam e**

# BEŞA PÊNCEM

## WANEYÊN BEŞÊ

1. QEWIL Û D`UA
2. RÊZGIRTINA JI ÇANDA CIVAKÊ RE
3. LIHEVBÛRÎN
4. HEVALTÎ

# ARMANCÊN BEŞÊ

Di dawiya vê beşê de, ji xwendekar tê pêşbînîkirin ku bikaribe:

1. Wateya qewil û du`ayan, nas bike.
2. Cureyên du`ayan, nas bike.
3. Awayê rêzgirtina ol û neteweyên din, nas bike.
4. Wateya çandê, nas bike.
5. Wate û girîngiya lihevbûrînê, nas bike.
6. Wate û girîngiya hevaltiyê, nas bike.

# 1 QEWIL Û DU`A

Toreya olî ya êzdayetiyê, ji çend janirên cuda pêk hatiye. Ew janir, ji aliyê rûxsar û naverokê ve, xwedî taybetî ye.

Qewil: Deqeke birêkûpêk e, di toreya olî ya êzdayetiyê de, xwedî cihekî girîng e. Ew bi taybet ji deqên olî yên êzîdiyan pêk tê û xwedî cihekî taybet e. Qewil ji sebeqeyan pêk tê û sebeqe jî mîna xelekên zincîrê bi hev tên girêdan.

Du`a: Weke têgeh tê wateya daxwazê; deqekî hûnandî ye, naveroka wê hêvî û daxwaz in ku ji Xweda, xas û çakan tên kirin.

Li cem êzîdiyan du`ayên ferz jî ev in:

1. Du`aya sibehê, di dema rojhilatê de tê kirin.
2. Du`aya êvarê, di dema roavayê de, tê kirin.

Di ola êzdayetiyê de, hejmareke pir ji du`ayan hene, lê ew ne ferz in, mîna: du`aya çareseriyê, du`aya xêrê û du`aya parastinê.

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| Janir | Cure |
| Rûxsar | Raman |
| Jêder | Çavkanî |

## Pirs

**1.** Qewil û du`ayê, pênase bike.
**2.** Qewil ji çi pêk tê?
**3.** Du`ayên êzîdiyan ên ferz, çi ne?
**4.** Di derbarê du`ayên neferz de, çend mînakan bide.

## Çalakî

**Hevokên li jêr sererast bikin:**

**a-** Du`aya sibehê bi şev tê kirin.

.....................................................................................

**b-** Du`aya êvarê ne ferz e.

.....................................................................................

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Wateya qewil û du`ayan.
2. Du`ayên ferz û neferz.
3. ....................................................

# 2 RÊZGIRTINA JI ÇANDA CIVAKÊ RE

Her civakek bi çanda xwe tê naskirin. Di hundirê her civakekê de, çandên cuda hene. Ev çand dibin sedema zengînbûna civakê û komkirina van çandên cuda, dibe çanda civakê bi giştî. Çand: Ew hemû nirxên mirovahiyê yên razber û şênber in. Ev nirx ji nifşekî derbasî nifşekî din dibin. Çanda her gelekî, nasnameya wî ye û wî ji gelê din cuda dike. Çanda her civakekê, ji zanist, kultur, çîrok, cilûberg, çandinî, huner .... wê, pêk tê.

Her neteweyek xwedî çand û taybetiyên cuda ye. Ji ber ku çanda gelekî dîroka wî ye û her gelek çanda xwe pîroz dibîne, pêwîst e her mirov rêzê ji hemû çandên derdora xwe re bigire û tu çandan reş neke.

Ji ber vê yekê jî divê em bi hev re bijîn, çanda xwe biparêzin û çandên cuda bipejirînin.

Ji ber ku çanda me û çandên gelên ku bi me re dijîn, hev temem dikin û ji bo ku em bêhtir hev nas bikin, divê em di derbarê çandên din de, pirtûkan bixwînin û bi wan re danûstandinê bikin.

**Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne**

**Bi destûra Xweda**

**Ev dinya pir rengîn e**
**Yê tijiya ji qewm û meseb û dîn e**
**Her qewmekî bi zarekî Xwedayê xwe dihebîne**

## Wateyên Peyvan

| Peyv | Wate |
|---|---|
| Zengîn | Dewlemend |
| Nirx | qîmet, qedir |

## Pirs

1. Civaka xwedî kîjan taybetî, dewlemend e?
2. Çand çi ye?
3. Çand ji çi pêk tê?
4. Divê nêrînên me ji çandên din re, çawa be?

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Çanda civakê pîroz e.
2. Rêzgirtina di navbera çandan de, ferz e.
3. .......................................................

## 3 LIHEVBÛRÎN

Lihevbûrîn: Rêgezek ji rêgezên mirovahiye ye. Di nava civakê de, di hêla rêzgirtin û hezkirinê de lihevbûrîn xwedî roleke girîng e. Ew bixwe rêgezeke sincî ye; civakê li pêş dixe, netewe û olên di civakê de, bi hev girê dide û têkiliyên di navbera wan de, xurt dike.

Di êzdayetiyê de, lihevbûrîn (efû) cihekî girîng digire. Ji mirovê êzîdî tê xwestin ku xerabiyê bi xerabiyê venegerîne û şaştiyên hevalê xwe bibûrîne. Pêwîst e ev lihevbûrîn ji dil be; ango mirov bê ku cudahiyê bixe nava tu netewe yan jî olan, li hev bibûrînin.

### Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne

**Bi destûra Xweda**

**Gazinda neke ji meseb û dîna**
**Ev dunya dewr e xwe jê derîne**
**Batin dê hemûwa li ser te bihesbîne**

**Lihevbûrîn, sembola dilê pak, aştî û sincên baş e. Divê mirov şaştiyên hevalê xwe bi gotinên xweş û rûyê biken, bibûrîne û ji bîr bike.**

## Pirs

**1.** Lihevbûrîn çi ye?
**2.** Divê mirovê êzîdî çawa danûstandinê bi mirovan re, bike?
**3.** Qewlê ku di derbarê lihevbûrîne de hatiye gotin, diyar bike.
**4.** Lihevbûrîn sembola çi ye?
**5.** Hevokên li jêr, ên rast bi (√) û yên şaş bi (×) nîşan bike:
   **a-** Lihevbûrîn, rêgezeke taybet a ola êzîdî ye. ( )
   **b-** Lihevbûrîn rêgezeke sincî ye. ( )
   **c-** Divê mirov dilpak û rûken be. ( )
   **d-** Divê em şaştiyên hev nebexşînin. ( )

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Girîngiya lihevbûrînê.
2. Lihevbûrîn li cem êzîdiyan ferz e .
3. ......................................................

4

# HEVALTÎ

Hevaltî: Ew têkiliyên rast, xweş û alîkariya di navbera kesan de ye.

Pêwîstiya tevahiya mirovan, bi hevaltiyeke rast ku li ser bingehê bawerî û alîkariyê ava bûbe, heye.

Hevaltî pir şêrîn e! Pêwîst e heval her dem xêr û xweşiyê ji hev re bixwazin û bikaribin dilê xwe ji hev re vekin.

Hevalê baş, ji çi olê yan ji çi neteweyê be jî ew bira ye. Hevalên baş, her dem di şîn û şahiyan de, bi dil û can li gel hev in. Divê heval di kar û gotinên xwe de, bi hev re rast bin û xwedî bext û wijdan bin.

## Ev sebeqeyek ji qewlên êzîdiyan ên pîroz e, wê bi dengê bilind bixwîne

**Bi destûra Xweda**

**Hevalê te yê li ser bextê te ye**
**Şîreta lê ke ew `eyba te ye**
**Li nav xelkê ew serhevda te ye**
***
**Bêbext nebe bi hevalê xwe ra**
**Wê bibe tarîx ji heyata te ra**
**Dinya dewr e wê bê ji te ra**

## Pirs

**1.** Hevaltî çi ye?
**2.** Divê heval bi hev re çawa bin?
**3.** Çima pêwîstiya mirovan bi hevaltiyê heye?
**4.** Valaiyên li jêr dagirin:
  **a-** Hevalê te yê li ser ................ te ye.
  **b-** Şîreta lê ke ew ............ te ye.
  **c-** Bêbext nebe bi ............. xwe ra.

## Ji waneyê fêr bibim:

1. Wateya havaltiyê.
2. Girîngiya hevaltiyê.
3. ..................................................